

## PYD bi eşkere petrolê derbasî navçeyên opozîsyonê dike

**Kurdistan** Mihemed Xidir



Partiya Yekîtiya  
Demoqratik PYD bi  
tankeran petrola xav  
derbasî navçeyên di jêr  
destê opozîsyona çekdar  
li her yek ji Serêkaniyê,  
Girêsipî û Cerablus dike,

herwiha beşek derbasî  
deverê rejîma Esed dibe,  
ev yek di demekê de  
ye ku li navçeyên di jêr  
destê Partiya Yekîtiya  
Demoqratik PYD de  
nirxê sotemeniyê buha

ye, û welatî bi rojan li ser  
dora mazot û benzînê  
radwestin heta ku  
sotemeniyê bidest bixin.  
Welatiyek dibêje, PYD  
dibêje ew şerê grûpên  
çekdar yên opozîsyonê

dike, lê di rastiye de ev  
yek ne rast e, û petrola  
xav bi tenkeran ji bo vê  
navçeyê dişîne, di dema  
ku li deverên me nirxê  
sotemeniyê buha ye.  
Welatiyekî din dibêje,



petrol ji bo rejîma Esed  
jî tê şandin, û ev yek  
bargiraniyekê li deverên  
Kurdistana Sûriyê çê dike,  
ev yek jibilî wê yekê ku  
petrol bi qaçaxî derbasî  
wan deveran dibe.



# NY: HSD, PYD û Ciwanên Şoreşger di çekdarkirina zarokan de berdewam in

Kurdistan-Bidûvçûn

Tevgera Ciwanên Şoreşger a ser bi PYD ve, 2 zarokên din li herêma Şehba û taxa Şêx Meqsûd a bajarê Helebê revandin. Rêxistina bi navê "Tevgera Ciwanên Şoreşger" bi armanca ku wê bikin çekdar, zarokeke 14 salî ya bi navê Fatime Rifet Hesên roja 52022/7/an ji bajarokê Til Rifetê revand. Fatime Rifet Hesên ji dayikbûna sala 2008an e û ji dê û bavê xwe ve sêwî ye, ew ji gundê Beradê yê navçeya Şêrewa ya Efrînê û bi mala meta xwe re koçberî bajarokê Til Rifetê bûye. Tevgera Ciwanên Şoreşger di destpêka vê mehê de keçika 16 salî Sêvîn Fewzî Hesên ji taxa Şêx Meqsûd a Helebê revand. Sêvîn Fewzî Hesên ji dayikbûna sala 2006an e, ji gundê Kurka yê Efrînê ye û ligel malbata xwe koçberî taxa Şêx Meqsûd a Helebê bûye. Ji dema kontrolkirina Efrînê ji aliyê artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve di Adara 2018an de, zêdetir ji 300 hezar kes ji Efrînê koçber bûn û hejmarek mezin ji wan li herêma Şehba ya li bakurê Helebê û taxên



Şêx Meqsûd û Eşrefiyê yên Helebê bi cih bûn. Malbatên zarokên revandî kiryarên Tevgera Ciwanên Şoreşger şermezar dikin û bang li rêxistinên ku girîngiyê didin mafên zarokan, rêxistinên navdewletî û aliyên pêwendîdar dikin ku fişarê li Rêveberiya PYD û Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD bikin ta ku çarenivîsa zarokên

wan diyar bikin. Tevî ku HSDê di Hezîrana 2019an de bi Netewên Yekgirtî re planek ji bo bidawîkirin û qedexekirina tevlikirina zarokan di nava çekaran de îmze kiribû. Lê ji dema ku peyman hatiye îmzekirin ve, rewşa revandina zarokan bi dawî nebûye. Di nûtirîn rapora Netewên Yekgirtî behsa mezintirîn bînpêkirinên derheqê

zarokan de li Sûriyê tê kirin. Netewên Yekgirtî di raporekê de behsa bînpêkirinên derheqê 2202 zarokan de dike li Sûriyê li sala 2021ê, ji wan 1824 kur in, 235 keç, û 143 kes regeza wan ne hatiye destnîşan kirin. Ligor Netewên Yekgirtî, proseyan biçekirina zarokan li seranserî Sûriyê berdewam e, di

sala 2021ê de 1296 zarok hatin bi çekirin. 569 zarok ji aliyê çekdarên opozîsyona Sûriyê ve. Li navçeyên Hikumeta Sûriyê jî 81 zarok hatine biçekirin. 255 ji aliyê HSD û Asayîşa PYD û Ciwanên Şoreşger ve. Netewên Yekgirtî ew halat digel 591 zarokan li Idilbê û 401 zarok li Helebê belge kirine. Belav jî kiriye, Tevgera Ciwanên Şoreşger berpîrs e di ber revandina 8 zarokan de. Dudilya xwe jî ji zêdebûna proseyan biçekirina zarokan û bikaranîna wan ji aliyê HSD ve nîşan daye, û daxwaz jê kiriye ku sînorekî ji wan bînpêkirinan re deyne. Herwiha behsa kuştina 424 zarokan jî kiriye, amaje bi wê yekê jî kiriye, 45 êriş li ser 28 dibistan û 17 nexweşxaneyan hatine kirin, û Hikumeta Sûriyê berpîrs e di ber 23 ji wan êrişan de. Çekdarkirin û revandina zarokan li Kurdistana Sûriyê bûye diyarde, û Partiya Karkerên Kurdistanê PKK destê wê di nava vê diyardeyê de heye, lewma xelk daxwazê ji vê partiyê dikin, şer û pîlanên xwe dûrî Kurdistana Sûriyê bixe, û dev ji zarok û mal û milkên wan berde.

## Pirsa mirovî ya xelkê Sûriyê di nava du agiran de ye

Kurdistan-Bidûvçûn

Encûmena Asayîşa Navdewletî bi piraniya dangan mekanîzmaya derbasbûna alîkariyên mirovî di sînore Sûriyê re ji bo heyama 6 mehan dirêj kir. 12 welatan dengê "belê" dan projebiryara ku ji aliyê Îrlanda û Norwêcê ve hatî pêşkêşkirin, di heman demê de jî Amerîka, Brîtanya û Fransa deng nedan biryarê. Mercên vê biryara nû, ji mercên projebiryara ku Rûsyayê pêşkêş kiribû û roja Îna borî xistibû dengdanê û dengên pêwîst wernegirtibû, ne

pir cuda ne. Biryara pejirandî ji bo 6 mehan e û ji bo dirêkirina 6 mehên din (heta 10ê Tîrmeha sala bê) pêwîstiya wê bi dengdana li ser biryareke nû heye. Her wiha biryara nû ji Sekreterê Giştî yê Netewên Yekgirtî daxwaz dike ku raporek li ser pêwîstiyên mirovî li Sûriyê û raporên berfireh li ser alîkariyan derbas dibin pêşkêş bike. Derbarê vê biryarê de Cîgirê Balyozê Amerîka li Netewên Yekgirtî Richard Mills got ku ev biryar zehmetiyê dide rêxistinên mirovî yên ku li wir kar dikin û got ku ev biryar

di demekê de hat ku pêwîstiyên mirovî ji berê zêdetir in. Di sala 2014an de, Encûmena Asayîşa Navdewletî rê da alîkariyên mirovî di 4 xalên sînorî re derbasî Sûriyê bibin, lê ji destpêka

sala 2020an de, di bin fişara Rûsyayê û Çînê de, ew alîkarî hatin kêmkirin û tenê di deriyê Bab El-Hawa ya bi Tirkîyê re derbas dibin. Piraniya welatên endamên Encûmenê Asayîşê (15 welat) ji bilî

Rûsyayê û Çînê tekezî li ser girîngiya berdewamiya derbaskirina alîkariyên mirovî yên navdewletî bi riya Tirkîyê bo Sûriyê dikin, ji bo parastina jîyan û zêdetir ji 4.1 milyon kesên ku li bakurê rojavayê Sûriyê dijîn.





## Ez Barzanî me lewma ez geşbînim



Munîb Ehmed

Di dirêjîya mejûye ve gelek Kurd gelek zordarî rû Eziyet ditiye ev zilm ji dema xwinmij Zehak ve heye ,ta roja iro dijminê Kurd û Kurdistanê ne tenê Miletê kurd xistiye Armanç belkû Ax ,Av,Çiya û Rûbar ,hemû rengê sitem kariye di derheqê vi gelî û xaka wî da bû ye zordariya li ser Kurdistanê û gelek kurd di dema kû Kurdistan li ser çar beşa başqe bû ye ji dema peimana Saiks-Pîko û piştê hatina Diktatoran li ser hûkim li welatên kû Kurdistan li wan dabeş bû ye ,li kurdistan Sor gelek zilm hatiye kirin ji aliye yek ji Diktatorên çarxa 20an (Stalin) gelek kurd ji cîh û warê wan bi darê zorê li Bajarên

Soviyta berê belav kir li her bajarekî li wir tû liqasî Kurda dibê û ew ji her bi Kurdîniya xwe ser bilindin û piraniya wan her mijûlî jiyana xwe bi rengê Kurdwarî derbas dikin û her heviya wan vegeerên li axa xwe Kurdistan Sor . Beşê di e Kurdistanê li Tûrkî her di hat weran kirin ji aliye hukimaten kû Tûrkî hûkim dikirin û bi Topan û Firokan Şoreşê Kurdî dişkandin ji ber ku çekê Şoreşvanan tenê Tifing bû lê mîrarniya wan Tikoşeran qet ji Top û Firokan ne ditirsyan û ta roja iro her Şofinizmên Tûrkiya gelê Kurd li Bakûrî Kurdistanê wekê xwedan dozeke rewa ne ditiye.Beşe Kurdistan Sûrî ji dema hikûmeta inqilabî ya Baas ve liqasî hemû rege piştgûhkirinê bû ye her weha hemû rengê Şofiniyete lê hatiye kirin û kûştina bê rahim di sala 2004 de kû encamê wê serhildana 12 Adara 2004 kû Kurdan li hemû bajarên Surî ne tenê Bajarên Kurdistan

Sûrî lê belê Bajarên wekû Helleb û Dimeşq û bajarê din e Sûrî rabûn serhildane û heta iro ev Rêjim rişde kû Sûrî ne aram bê û xweşiye bo gelê Sûrî bitavaî û bi taibet gelê Kurdistan Sûrî na binê Maf ,tenê xwe dibinê xwedanê Sûrî wekû Baxekî tenê ji xwe re .15 e Adara 2011 an Şoreşa Sûrî dest pê kir lê disa Rêjima Sûrî bi regekî hova ne beramberî Vê Şoreşê rabû di encamê de piraniya Bajarên Sûrî werankirin û nêzikî nivê gelek Sûrî panaber bû ta roja iro ev zilm berdewame .Rojhilatî Kurdistan ji gelek eziyet ji destê Rêjima Iranê ditiye Şahê Iranê di sala1946 de ûmeda gelê Kurdistan Rojhilat tek bir dema kû Pêşewa Qazî Mihmed Komara Mihabad ragihand dema kû nemir Mustefa Berzanî wezirê bergiriye bû lê Pêşewa Qazî hat sêdaredan û Komara Mihabad nêzikî salekê tenê berdewam kir Pakrewan Qazî Mihemed Aleya Kurdî Radestî Cengewer Nemir

Mustefa Berzanî kir û Berzanî kari bû soza xwe ya ji Qazi re dabû bicih bikê piştî xebateke bê hempa di encamê de Kurdistan Başûr Anatomî wergirt û dût re ev Tikoşîn berdewam bû bi serperştiya Serok û Pêşmerge Masûd Berzanî kû karibû Kurdistan Irakê wekû Dewet bikê Herêmeke Fîdral Avakir û dilê her Kurdekî xweş û geş kir ew ji bi saiya xwîna Pakrewanan bû û berxwedana pêşmergen Cengawer û di serî de Serok û Pêşmerge Masûd Berzanî kû her û her xwe wekû Pêşmerge dibinê û her li ser sengeran bi cilê Pêmergayetiye te ditin .Serok Masûd Berzanî ne tenê ji bo Kurdên Iraqê dilzoze belê bo hemû Kurdan li her deverî kurden her çar parçê Kurdistanê û Kurden li Diyaspore .Serok Berzanî Xwedanê 48 Melion Kurde û bo hemû Kurdan xebata Diplomasi dikê ,kariye piraniya Welatên Cihanê bikê dost ji gelê Kurd re ,û hemû Dewlet pêşwaziya

Serkirdeyen Kurdistanê bi Ala Kurdî dikin û li ser Firokgihan te bilindkirin ,û ji bo gelê Kurdistan Sûrî Serok Masûd Berzanî piştewaniya gelê Kurdistanê kiriye di dema Şoreşa Sûrî ve bi 100 hezaran Kurdê Sûrî himbêz kiriye her weha Pêşmergên Roj kû her ûmeda wan vegeerên Kurdistan Sûrî û bergiriye ji Ax û Miletê Kurdistan Sûrî bikin bi serperştiya Cenabê Serok Berzanî ve ten amadekirin û ji Aliye Siyasi ve Serok piştewaniya doza gelê Kurdisrana Sûrî dike û hemû core arikariye pêşkeş dikê û bi Raiyadarên Dewletên Zilhêz re her dawa çareseriyeke ji Sûrî re dikê û dawa taibetmendiya deverên kurdistan Sûrî û gelê kurd di Sûriyeke ne navendî ji bo hemû gelanê Sûrî dikê û bi taibet gelê Kurd û ev tişt de bibê û li ber Çavê mine ji ber vê yekê Ez Berzanî me û Ez geşbînim.

## Li bajarê Serbestiyê - Çîrok



Xemgîn remo

Gava ku firoke ji firogehê bilind bû, bi ezmana ket û berî da roava, heta bi wê kêlikê jî min bawer nedikir, ku rojekê ji rojan ezê welatekî ewrupî bibînim, ewrupa ku min gelekî wêje ya wê xwendibû, li pir filimên wê temaşekiribû, û gelek peyv û gotinê ji hevalên ku diçûn û dihatin, li ser şaristaniya wê bihîstibûn, ji min re bibû kul, ku ez jî vê buhiştê bibînim. Li vî welatê ku ez lê çêbûm û ta niha nêviyê temenê xwar, heta berî şeş mehan jî, ez hîn bê nasname bûm, wergirtina nasnameyê jî, ne ji mirovatî û comerdiya rêjîmê bû, belê piştî ku xwepêşindana destpêkir û xwîn rijîya, rêjîm neçar ma ku berî her tiştî vê pirsgirêkê çareser bike û roja ku min nasname wergirt, min jî berî her tiştî pasteporta xwe derxist, da ku ez carna karibim vî sînorê bê mirêz derbaskim, berî hingê ez tim bi xerîbiyê hest dibûm, ku ez li welatekî xerîbim û dest û pêyên min bendikirîne, lê niha ez wiha hest dibim: ku benda pêyên min şikest, bazkê min çêbûne û ez difirim. Vêga parîs!! belê parîs bajarê bodlêr, mobasan û hogo, aragon û rambo, belzak û zola û kî û kî? eger ez wan bihijmêrim, heta ku ez bighêr parîs jî, dawîya wan nayê. Li firokgehê du hevalên ji (komelgeha rewşenbîrên kurd li ferensa) û hevalekî din, bi germî pêşewaziya min kirin, li ser daxwaza wan, ez bi hefteyekê berî êvarxwendina helbestî gihiştim, da ku ew jî kar û barê xwe bikin, millet agedar bikin û cîgehê holê destnîşan bikin, her wiha cihê mêvantiya min jî, li mala hevalekî hatibû destnîşankirin. Demsal, buharek ji buharên parîsê bû, û hevala di wê hefte ya berî êvara helbestxwendinê de, çî kêmasî nedikirin, bi roj pêde min li nav bajêr digerandin, em diçûn

mozîxane yên dêrîn, li nav bexçeyên sipehî, ku bi endazyarî hatibûn danîn û bi gulên hemereng dixemilîn û bi şev jî em diçûn xwaringehên herî xweş, me dixwar û vedixwar û hevala tim ji min re digotin (de çavên xwe ji dîtin û nerînê têr bike heyran) bi rastî jî dîtin û gotin ne wek hevîn, minê li çî binerya û ne çî!? li kolanên fireh, dirêj û pan, li avahiyên ku serê wan di nav ewran de û ev dêwê hesinî ku dibêjinê (bicê îvil) li mozîxane yên dîrokî, li firoşgehên balkêş û jinên dilrevîn? û hevala tim bi henekî digotin (keko li vê derê serbestiyê, eger te divê, emê te bi vê keçê bi wê jinê bidin naskirin, ji xwe çî astengî nîne, hema ku gotin (erê) tê karibe îşev bi wan re razê û wek tu dizane, di nav nivînê de wergerandina zimên ne pêdiviyê, tenê ku tu karibe wê bi vî alî û wî alî de wergerîne, ha ha ha ha.. ) min jî di dilê xwe de digot (erê law, we jî, ji bo vê serbestiyê welatekî bindest li dûv xwe hiştiye) Hefteyek bi ger û ken û laqirdiya bûriya, li êva destnîşankirî, demjimê heyşet, li holeke fireh û dirêj û bi amadebûna cemawerekî ku ji deverên cûr be cûr hatibûn, ez derketim ser dika şanoyê, li destpêkê min sipasiya komelgehê kir, li ser vexwendina wan ku ez vexwendî kirime, her wiha min xêrhatin bi amadeyan dan û dest bi xwendina helbestan kir, helbestên ku naveroka wan li ser dagîrkerî û setemê bûn, yên li ser mişextîbûn û derbederiyê, yên êş û azar û kovana, demjimêrek bi vî awayî, di nav çepik û hêsir û keseran re bûriya, xwêdan ji min diherikî. Gava min rahişt piyala avê, ku gewriya xwe şil bikim û hindekî bêhna xwe vedim, çend keç û xorta destên xwe hildan û gotin (mamusta qey te çî carî heznakirîye? dawiyê li axîn û keseran bîne, me hinek helbestên evînî divê) holê pêkve li çepika dan, ku ez xwesteka wan pêkbînim, ez neçar mam û berî ku dest bi helbestê evînî bikim, bi kurtî min got (belê min evîn dîtiye û ez hîn jî evîndarim, lê devera ku serbestî lê tinebe, evîn bi kul û keseran dibûre, nivîsê ku hun li van welatan çêbûne, belkî we ev derd û kul nedîtibin, lê yên ku li welêt mezin bûne, vê êşê baş dizanin û ji were

gurez ji axîn û keserên min, dengê çepikan dîsa bilind bû, ango em gudarî. Min demjimêrek bi xwendina helbestên evînî jî bir serî û êvariya min jî bi dawî bû, min dubare sipasiya guhdara kir û ji ser dikê daketim, li jêr pêlikan jinek ciwan, rê li ber min girt, devliken û destê xwe da min (tu gelekî bi xêr hatî, min bawer nedikir wê wiha zû bi zû porê te sipî bibe! ev çî bi tehatiye?) çî nema ku ez bêjim (ma tu ji zûde min nasdikî?) nerînê min çûn ser xala li jêr gerdena wê, ku hîn jî wek libek nok reş xuya dikir! ax dilê min ev roja ye! rojekê ji rojan, li welatê bav û kalan, bîst sal berê, ev evîna min bû, derd û kulê min bû, sê salên bi axîn û keser min di gel wê bûrandin, lê ez bawer nakim, ku min ev xal sê caran maç kiribe, destê wê di nav destê min de û bi bêhrîkirin li min dinêrî, ez jî mîna ku ketibim gerînokê, serê min werbêj dibû û min nema dizanê ku çî bikim, ez dibêjim ku hina xatir ji min dixwestin û hina sipasiya min dikirin û min jî bê deng bi serê xwe li wan vedgerand...: mamuste em nerin? ez lê zivîrim, hevalê min yê ku ez li ba wî dimam û berî ku ez bersivê bidim, roja zû got (mamuste îşev mêvanê mine) û destê min givaşt. Ji hivde saliya wê min jê hezkir ta ku giha bîst sala û ez ne amade bûm ku wê bixwazim, min hîn xwendina xwe bidawî nekiribû û ji nişkave xortekî ku pênc salên wî li ferensa bû û li welêt cîranê hev bûn, xêzana wî evîna min jê re xwestin û wê şandin ba wî, wê jî hîç di ber xwe neda û li hêviya min nema, ta ku ez amadebibim, ew bi rê ya xwe de hat û min jî li şûnwarê wê keser dikşandin û heta wê kêlikê jî çî tîkelî di navbera me de çênebibûn, min zanibû ku li ferensa ye, lê li kîjan bajariye çî agahî li ba min nebûn, niha temenê min gihaye çîl û du sala û hîn jî ez bê jin û zarokim. Bi rê de, destê xwe ji nav destê min dernexist û min nizanibû ku çî dibêje, tenê min serê xwe dihejand, heta ku em ji tekiyê daketin, li qatê duda gava ku kilît li derî da û lempe yên hindir veketin, ez ji nuh veciniqîm, mîna yekî ku ji xew hişyar bibe, min li derorê xwe dinêrî, xaniyekî biçûk û paqij û gelekî li hevhatî, lê çî deng û pêjin jê nayê! mîna ku ya di dilê min de

dixwend (ez bi tenê me, ji berî du salan de, min mîrê xwe berdaye û zarok ji min re çênebûn) û destên xwe li situyê min da hev û devê xwe xist gerdena min de, bêhnek dirêj kişand û xwe hinekî bi şûnve da, (te gelekî xwîdan daye, av germe, her serşkê xwe bişo, ezê jî şivê amadebikim. Bi rastî jî min gelekî xwêdan dabû û hîn jî ez di bin bandora hevdîtina wê debûm, min xwe di hindirê banyo de dirêj kiribû, ava germ û kefa pir, bera bera laşê min sivik dikir û mejiyê min yê ku benc bibû, hilm bi hilm dijeniya û hîn jî min ji xwe re digot: ez di xewnê de me, lê gelek tiştên ku di jiyana rojane de dibin, di xewna de jî pêknayên. Gava ku ez ji serşokê derketim, roja jî, ji pêjgehê derket, ew cilên ku lê bûn, bi tenik kirasekî xewê hatibûn guhertin, ku tenê deverên şermiyê nixumandibûn û mêbûnek zêde jê dirjiya! roja ku li welêt tim serê wê di ber debû û bi şermî silav dikir, şerm daye alîkî û mîna jinek ji xwe bawer tevdi gere! piştî ku şuşeyek sormeya Bordo jî danî ser masa xwarinê, vêga devê xwe xist devê min de û maçek bi tîn û dirêj, ji lêvê min mêt. Me şevbuhêrka xwe bi xwarin û vexwarinê, bi bîranîn û gazin û gilî û hinde caran bi ken û laqirdiya dibûrand û gava min jê dipirsî (ma em li kîjan serdemê ne? em li serdema tora hevghiştina civakîne, te ne mesacek ne nameyek û ne jî doza hevalxwestinê ji min kirî?) bi keser û dilêşî digot (bi rastî min ceger nedikir, ez ditirsyam ku tu li min venegerîne û hevaltiya min nepijirîne, wê bo min mirna dawî ba, li min bibûre ez gunehkarim, lê divê ku tu vê yekê jî bizanibe, gava ku mîr tîkelîyan yan hevaltiyê ji jina dixwaze û jin wî di desr guha re davêje, dibe ku li ba mîra tiştêkî asa be, lê li ba jina ev yek mirine û îşev min li pê dilê xwe kir, ez bi serê te sûnd dixum, ku te guh nedaba min û bi min re nehatiba malê, minê ya xwe kuştiba yan jî ezê demek dirêj nexweş ketibama, sipas, sipas cano, ez minetkara te me) li dawîya şevbuhêrkê, bi destê min girt, berê min da jûriya razanê û digot (cano, ku li welêt nesib nebû û serê me neçûn ser balgeyekê, mêvanê min ez îşev yara te me. Sibehê li ser taştê, roja

mîna perwana ku li ser gula perwaz didî, gelekî geşbîn bû, û ji min re digot (te hefteyek bi dost û hevalên xwe re bûrand, tê vê hefteyek ji min re be, ezê îro te bibim bajarê KAN, sibê mrhrecana sînema destpêdike û tu ji filîman hez dike, başe?) pêşinyarek ku min nikaribû nepijiranda, her wextê delîveyên wiha bi destnakevin, min telefonî hevalê xwe kir, yê ku ez di mêvandariya wî debû û min jêre got (heyran ezê di gel roja xwe, ya ku çûbû ava û ji nû hilatiye, herim bjarê kanê) hevalê min bi ken digot (erê heyran, wisa hatiye gotin: kesê ku yara xwe dibîne, dost û hevala ji bîr dike, de here cano here). Her tiştê vî welatî balkêş û cûda ye, rêxistina mehrecan bi awakî gelekî bi rêk û pêk hatibû dîzan kirin û ekter û derhêner ji gelek welatên cûr be cûr hatibûn û min roja gelek ji wan rû birû didîtin, me li filîman temaşe dikir, dixwar û vedixwar û bi hevve radizan û roja bi her awayî bizav dikir ku min bi xwe ve girêbide, (rewşa welêt her ku diçe ber bi aloziyê ve diçe, wê arîşe ya we gelekî dirêj bike û paşeroj di nav mijê deye, tê vegere ser çî xwe? ez hevvelatiya ferensa me, emê herin dadgehê û şiwîkirina xwe ragihînin, tê jî piştî kurtedemekê nasnameya wergere, tu çima ji buhiştê direve?) min jî tim jêre digot (roja ev buhiştana yên xwediyan xwe ne, ne ji bo me ne, helbet wê ev ne cara yekem û dawî be, ku ez tîm û min divê ku ez tevaya ewrupa bibînim, lê ku mirinek min hebe, wê li welatê min be, li ser axa min be) roja gelekî ji van serhikiyê min bêzar dibû, lê ez ji bîr û baweriyên xwe danediketim. Min hefteyek di gel roja bûrand û dema seredana min jî bi dawî bû, li roja vegeerê, roja û du heval bi min re hatin firokgehê, daku min bi rê bikin û berî ku firoke ya me rabe bi çend kêlikan, roja bi destê min girt, ez dam aliyekî (cano ezê peyva dawî ji te re bêjim, rewşa we xirabeye û wê bêtir xirabibe, çî gava ku cî li te teng bû were, ez nema çî mîran dikim, lê tu kengî bê ez li hêviya te me) û hêsir ji çava diherikîn, min jî dubare jêre got (roja can, ezê li ser axa xwe bimrim, ez jî çî jina nînim û tu kengî vegere, ez li hêviya te me).